

Agahdariyên giring derbarê daxwaznameya penaberiye Ji bo penaberan

KURDISCH (KURMANCİ)

Kîjan belge û isbat ji bo daxwaznameyê lazim in?

Pêşkêşkirina daxwaznameyê civanê te yê pêşî li ba dezgeha dewletê ye ji bo karûbarê koçberiyê û penaberan (Bundesamt für Migration und Flüchtlinge). Em di vê civîna pêşîn de pirsan derbarê nav û nîşanên te, cihwarê te, xwendin û sinhetê û pişeyê te, zimanên ku tu pê dizanî û herweha derbarê rêya ku tu têra hatî Almaniya ji we dikin. Di vê civînê de wergerek jin yan mêr beşdar e û her tiştî ji bo te werdigerîne zimanê te.

Taku daxwaznameya te ya penaberiye zû bi rê ve here, ji kerema xwe re van belge û isbatan weku kaxet bi xwe re bîne, **helbet heger li ber dest bin:**

Belgeyên kesayeti – Ji kerema xwe re bi tenê belgeyên eslî

- Pasport
- Nasnameya kesayati
- Nasnameya dibistanê
- Belgenameya jidayikbûnê
- Begleya ajotina seyarê
- Ixracqeyda malbatî
- Deftera malbatî
- Belgeya zewacê
- Deftera leşkeriyê
- Nasnameya kar
- Nasnameya endametiye
- Belgeyên kar
- Bawername anku şehda (emê kopiyekê ji ber wan bigrin û belgeya eslî li dawiya daxwaznameya te careke din li te vegezin)

Belge derbarê sedemên revîna te ji welatê te

- Wêne
- Biriya yan hukmên dadwerî derbarê dozên dadwerî
- Fermanên girtinê
- Gilîname derbarê lêkolînên polîsan yan belgeyên din ji aliyê polîsan ve
- Nameyên tehdîdê
- Gotarên rojnameyan (Ku navê we bi xwe tê de hebe)
- Belgeya mohrkirina zaroktiyê
- Name û mesacên tora civakî (Facebook, Instagram, Twitter û hwk.) heger ev belge derbarê sedemên revîna te bin.
- Belgeyên din, wek mînak nameyên şahidan

Raport

- Raportên doktoran
- Nameyên doktoran
- Raportên bisporên nexweşînên derûnî
- Belge derbarê kiriyarên zordarî/lêdanê yan îşkencê
- Belgeyên din

Haydarî: Ji kerema xwe re bi tenê belgeyên taybet bi doza xwe bi xwe re bîne. Divê tu van belgeyan **kopî bikî** û bi xwe re bînî. Heger ev belgeyên te li ser cîhazan tomarkirî bin, anku dîgîtal bin, tu dikarî ji karmendên kampa xwe bipirsî, ka tu dikarî li kuderê wan belgeyên xwe kopî bikî.

Belge û raportên doktor û bisporan dikarin ji welatê te bin, ji welatekî din bin yan ji Almaniya jî bin. Heger pêdiviya te bi doktorekî hebe, tu dikarî serdana doktor bikî û xwe kontrol bikî.

Heger tu **ne** li kampa sereke yan penaberan hatibî bi cih kirin û cihê te veguhastibin devereke din, ji kerema xwe re navnîşana xwe ya nû bide me yan ji me re bişîne.

Heger te daxwaziya penaberiye pêşkêşkiribe, wê demê wê nasnameyekê (Aufenthaltsgestattung) ji bo dema birêvebirina doza penaberiye bidin te. Divê ev nasname herdem bi te re be.